# ŞENGAL DI NAV QÎLÊN QIRKIRINÊ DE

## Şeş sal piştî komkujia gelê Êzdî û qirkirina jin a Êzdî





KONGRA STAR
مؤتمر ستار

## Pêşgotin

Şengal bi dûrbûna 80 km ji sînorê welatê Sûryê wårekî li başûrê Kurdistanê ye (Iraq) ya ku dikeve rojavayê Musulê.

Li gor dîroka Êzîdî, bi giştî di herêma erdnîgariya di navbera welatê Iraq û Sûryê de jiyan dikirin. Li gor serjimêriya netewên yekbûyî, di demekê de hejmara şêniyên Êzdî nêzî 550 hezar kes bûn, bi taybet şêniyên li Şengalê jî sedî 70% Êzîdî bûn. Wek kêmnetew jî li Tirkiyê û Sûrî jî hinek jiyan dikirin, lê her hejmara wan kêm bû, bêtir ji salên 80'î di sedsala dawî de, ew jî bi sedema perîşanî koçberi hîla welatên Ewropa bûn, bi taybet li Elmaniya, ku heta niha 40 hezar kesên Êzdi îro li wir jiyan dikin.



Şengal. Çavkanî: Medico International (01/2018)

## Çima Daiş Êzdiyên Iraqê û bi taybet jî jina Êzîdî armanc girtin?

Di bûrîna dîrokê de, gelek ferman û komkujî li serê gelê Êzîdî de hatin e û bi taybet ji dema êrîşa pişaftina nijadî ya ji sedsala 19'an ya koçberî, ta Enfal û komkujiya Şengalê ji destê Daiş. Êzdî rastiya 73 ferman di dirêjaya dîrokê de hatine. Di Fermana dawî Daiş di 3'ê Tebaxa 2014'an de êrîş bir ser Başûrê Kurdistanê û Şengalê, ji bo firehkirina binyata Dewleta xwe. Berya van êrîşan pêşmergêyên Başûr bê şert û merc û ji nişka ve bê berxwedan xwe ji Şengalê vekişandin û miletê Şangalî radestî Daişê kirin. Bi deh hezaran Şengalî, ji tirsa hovitiya Daiş reviyan û xwe avêtin li ser çiyayê Şengalê . Û li wir bi rojan asê man, gelek ji wan ji tîna, birçîna û ji ber êşên dijwar mirin û yên mayî jî dîl ketin destê DAIŞê. Yên ku dîl ketin destê DAIŞ wek jin, zarok û zilam birin berfirehiya dibistanan de û li wir mêr cudakirin û ew kuştin. Tenê di komkujiya gundê Koço de, 500 mêr bi berikê qilêşan hatin kuştin û tenê 19 jin li Mûsilê di qefesan de li rûbarî bêdengiya gelên Ereb û Cîhanê de hatin şewitandin. Gelek ji wan birin devera Til Eferê, piştre ew birin Mûsilê û di pêy de ew birin bajarê Reqa li Sûryê, heta ku ji hêla Hêzên Sûrya Demoqratik hatin rizgar kirin.

Her jinek an keçek Êzîdî gelek caran li bazara Beniyan, dihatin firotin, hem jî ew bidarê zorê ji xwe


Êzdiyên ku ji Şengal direvin. Çavkanî: ANF (18/07/2018)

re dikirin kevanî û di bin setemkarî û zordariya li gel kesên Daişî diman, ta ku jê xemsar dibû, ew dê carek din bihata firotin an jî diyarî kesekî din dikir û her wiha...

Lê jinên zarok û kawî, zarokatiya wan di jiyanê de dihat qurmiçandin û di setemkarî û zordariyê de derbas dikirin.

**Serhejmarên qurbaniyên Êzdiyan:**

- 550.000 Hejmara Êzdiyan li Îraqê
- 360.000 Êzidiyên ku  bûn kocber
- 2.745 Zarok ku sêvî man
- 6.417 Kesên ku hatin revandin:
  - 3.548 Jin
  - 2.869 Mêr
- 3.530 released Yezidis, including:
  - 1.199 Jin
  - 339 Mêr
  - 1.041 Keç
  - 951 Kur
- 1.293 ku de rojên destpêkê hatin kuştin
- 2.877 people still detained by ISIS - their fate is unknown:
  - 1308 Jin
  - 1569 Mêr
- 81 Goristanê komî ku hatin dîtin
- 68 tekî yen pîroz ku hatin ruxandin

## Rola YPJ û YJŞ di rizgarkirina jinên Êzdî de

Ji bo tolhildana jinên Êzdî bi armanca rizgarkirina jinên ku ji hêla Daiş hatin revandin YPJ û YJŞ beşdarî hemla Xezeba Firatê bûn. Ew li bajarê Reqqa yê di sala 2016 an de li bajarokê Tebqa destpêkirin, ta gihiştin navenda bajarê Reqqa û wan deveran rizgar kirin. Hemleya Baxoza Cizîrê li Dêra Zorê bi dawî kirin.

YPJ di rizgarkirina 3 hezar ji 6417 jin û zarokên Êzdî yên revandî, rolek pir giranbuha lîstin. Ew wan radestî mala Êzdiyan û desteya jinê li Cizîrê kirin û alîkariya manewî û nefsî ji jinên rizgarkirî re pêşkêşkirin. Hem jiyan wan ya xwezayî li wan vegerandin û hem alîkarî bi tevlîbûna wan di civakê de kirin.

Pişt re ew hatin radestî Encûmena jinê li Şengalê kirin û ji wir hatin radestî malbatên wan kirin. Tevgera jin a Şengalî bi jin û zarokên rizgarkirî re bû alîkar da ku ji tirsê xilas bibin. Di heman demê de ji hêla nefsî de zarok ji ramanên reş yên ku Daiş di mejiyê wan de çandibûn ew xilas kirin û ew wan li jiyana wan ya civaka Êzdî vegerandin.



YJŞ û YPJ li Raqqa. Çavkanî: greenleft.org.au (23/09/2017)

Di derbarê vî tiştî de hevseroka Encûmena mala Êzdiyan li herêma Cizîrê Leyla Ibrahîm got: "Piştî vê komkujiya mezin li dijî gelê me yê Êzdî û vê zordarî ku ji destê Daiş hat dît, me xwe birêxistin kir, û em hewl didin ku alîkariyê bi her awayî, bi jinên Êzdî yên rizgar kirî re bikin. Ji bo em wan ji sawa tirsê xelas bikin, ew tirsa ku bandorek pir mezin li nefsiya wan kiribû. Em niha bûne xwedî vînek pir xurt. Me yekîneyên parastin, Encûmena Şengalê û Encûmena jinê ava kiriye, ev rêxistin tev de ji bo ku wek van komkujî û qirkiran careke din di ser gelê me yê Êzdî dubare nebe. Ruxmî hemû astengian jî gelê me yê Êzdî dîsa vegeriyan warên xwe, ji bo ku xaka xwe biparêzin."

Leyla Ibrahîm, xemsarî û bêdengiya hikûmeta Iraqê û ne alîkariya wê bi gelê Êzdî re rexne kir û wiha got: "Heta niha hikûmeta Iraqê mafê Êzdiyan nedaye wan. Şengal beşek ji welatê Îraqê ye, lê bi erkê xwe yê zagonî li hêla mafê Êzdiyan nedaye xuya kirin, alîkarî ji wan re pêşkêş ne kiriye û bi erkê xwe di serhejmartin kesên wendayî ranebû ye."

Tev ku avakirin û rêxistnkirina encûmenên sivîl û leşkerî jî, heta niha êrîş li ser mafê Êzdiyan de tên kirin. Êrîş li ser pêşengên Ezdiyan mina Zekî Şengalî û Zeredeşt Şengalî bi firokên bê mirov yên dewleta Tirkiyê hatin kirin û ew hatin şehîd xistin. Tirkiyê dixwaze pirojeyên netewa Demoqratîk, biratiya gelan û jiyana hevbeş di herêmê de biruxîne.

## Rola welatên cîhanê diderbarê miletên Êzdî û daxwazên ji wî de

Ruxmî ku bi dehan civînên navnetewî yê bi banga mafên mirovahiyê çêbûn jî, heta niha ew komkujiya li ser Şengaliyan nehatiye qebulkirin û tu dadgeha navdewletî û darizandina kesên sûcdar nethat kirin û kes nehat ceza û gunehbar kirin.

Tev ku pir bang ji saziyên mafê mirovan re hatin kirin jî, ew bangawazî bê bersiv û encam man. Lewra em ji her welatek dixwazin ku alîkarî bi gelê Êzdî re bikin, ku miletekî aştîxwaz û xwedî dîrok û çandeke kevnare, û ji hezar salan de bi her pêkhateyan û li ser esasê biratiya gelan di vê herêmê de jiyan dike. Pêwiste  serxwebûna gelê Êzdî bê ragihandin û her wiha em doaxwaza dad û dadgehek navdewletî dikin da ku tewanbar û welatên bi wan re hevkar werin ceza kirin.




Xwepêşandana jinên Êzdî . Çavkanî: **ANF (29/03/2018)**

KONGRA STAR
مؤتـــمر ســـتار

Tebaxê 2020

## PEWENDÎ

pewendiyenjin@gmail.com
eng.kongra-star.org
Facebook: Kongra Star Women´s Movement
Twitter: @starrcongress